



# Yekane rê yekitî ye



**E**ndama konseya rêveber a KNK'ê Şehla Hefîd, endama KNK'ê Runak Ehmed û Medya Efrîn, Delegasyona ji Rusyayê Liyana Sumoyan û Bêgerd M. Kurdistanî li ser girîngiya yekitiya netewî, qonaxa ku gelê Kurd tê de derbaz dibe û erka pêşeng ya jinan de nêrînen xwe bi rojnameya me re parve kirin:

**Şehla HEFÎD/ Endama Konseya Rêveberiya KNK'ê:** Wek gelê Kurd pêdiviya me bi yekitiya netewî heye. Bi taybetî jî îro ku li çarperçeyên Kurdistan şert û merc guherîne, yekitiya netewî ji bo me pirsgirêka man û nemanê ye. Dijminê Kurd li dijî gelê me bûye yek. Dema mijar dibe Kurd tevahiya nakokiyên di navbera xwe de didin alî û li ser dijminahiya Kurd lihev dikin. Sedema şikestina Kurdan di her pêvajoyekê dîrokî de, ji ber nebûna yekitiya di navbera hêzên Kurd de bûye. Ji ber vê çendê yekbûna me girîng e. Ji bo vê jî hewceya hemû partî û rêxistin, berjewendiyên siyasî û malbatî deynin aliyekê, ligor berjewendiyên netewî tevbigerin. Ger hêzên parastinê nebin yek jî lazime li bera dijber jî nesekekin û pêwîst bike alikariya hev bikin. Erka ku dikeve ser vîna siyasî, aştiya hundirîn pêkanî û asteng kirina nakokiyên heylê bê ku bigihîjin asta tundiyê.

Jinên Kurd di tevahiya dîrokê de di ferqa erk û berpirsariyên xwe bûye. Di salên dawî de sekna Kurdan a belav, bandor li rola jinê a di nav civakê de kiriye. Di nav civakê de bûyerên tundiyê zêde bûne. Lê jinên Kurd bi şoreşa Rojava re carekedin bal kêşane ser rola dîrokî a jinê û hay li hebûna xwe a di nav şoreşê de bûne. Li Rojava ku ji bo jinên Kurd û çîhanê pergalek nû hatiye avakirin, jin ji bo parastina axa xwe, di serî de parastina rewşa, di nav tevahiya mekanîzmeyên însaya civakî de tevlihbûnek çalak dane çêkirin. Helbet li perçeyên din ên Kurdistanê jî jinan têkoşîn meşandiye û mohra xwe li berxwedanê girîng daye. Ji vir şûnde jî ji bo pêkanîna yekitiya netewî hewceya bi rol û erka xwe rabe.

**Runak EHMED / Endama KNK:** Yekitiya netewî mijarek girîng e. Di serî de jin tevahiya gelê Kurd ji bo ku ev yek pêk bê lazime tevlihbûnek çalak bide çêkirin. Berê her tiştekê jî pêdiviya me bi kongreyek netewî a ku hemû partî, alî û kesayetên Kurdistanî bîne gel hev, heye.

Kongreya Netewî a Kurdistanê-KNK, li dijî seknên perçeyî û êrîşên dijmin lazime rola parastina civakî bilîze. Ji bo vê, girîng e ku KNK wek sazî xwe bi hêz bike û tevahiya kes û beşên civakê bigihîne hev. Berovajî vê yekê jî êrîşên dijmin rizgar bûn wê zehmet be. Ji ber ku her tim em dibin êrîşê dene, yekbûna me û bi taybetî di qada siyasî de xwe parastin şert e. Di mijara yekitiya netewî de berpirsariya dikeve ser jinê mezintir e. Çawa ku em axa Kurdistanê jin û mêr bi hev re, bi têkoşînek hevpar diparêzin, bi heman nêzikatiyê jî lazime em siyaseta bikin.

**'Hevgirtina li dora yek armancê'**

**Bêgerd M. KURDISTANÎ:** Kurdistan berê ve bi sedsalan di encama peymanên Sykos-Picot hat perçeyî kirin. Hewceya hemû partiyan siyasî ên çar perçeyê Kurdistanê di bin banê KNK'ê de bîna cem hev, di bin vê yekitiyê de têbikoşin. Di demê de ku çar

perçeyên Kurdistanê di nav zor û zehmetiyan de derbaz dibe, yekitî ji pêdiviyekê wêdatir, pêwîstiya ku ne pêkane dest jê bê berdan. Dijminê Kurd, weke ku ev yek jî nebesbe, vê carê jî dixwazin me di her perçeyekê de cûda cûda perçe dikin. Ji bo vê çendê, pêwîste ji ferasetên teng ên partiyanê dûr bisekinin, netewî bifikirin û em li dora yek armancê bicivin. Ger em yekbûna xwe çêbikin, em dikarin li dijî dagirkerên Rojava, Bakur, Başûr û Rojhelatê Kurdistanê bi hêz bin, em çîqa bi hêz bin, ewqas jî dikarin berxwedanê mezin û belav bikin.

Li her perçeyekê Kurdistanê dijmin planên qirkirinê çêdike. Koçberî û dardekirin belav dibe. Dijmin kuştinê bes nabîne, dadikeve nav her şaneyek civakê, bi rêya medyayê manipule dibe û hemû nîrxên Kurd ên çandî tune dibe. Civaka Kurd lazime di vê mijarê de hişyar be, xwedî li axa xwe derkeve. Hewceya jin jî her demê zêdetir mudaxilê pirsgirêkan bibin, bi avayek çalak beşdariya xwe a siyaseta bidin çêkirin. Jinan di dîrokên cihê de beşdariya xwe a berxwedan û têkoşînê çêkiriye, axa xwe parastiya, ji bo vê şer kiriye, lê belê di pêvajoya diyar kirina qedera xwe de, her tim li derve mane. Niha dem dema guhertina vê yekê ye. Şoreşa ku di pêşengtiya jinê de li Rojava îro şînbêr dibe, di rojava tevahiya çîhanê deye. Ev yek jî girîngiya rol û tevlihbûna jinê radixe ber çav an.

**Kurdistan a azad encax bi ferdê azad pêkan e**

**Liyana SUMOYAN: (RUSYA DELEGASYONU)**  
Lazime em di ferqa girîngiya yekitiya netewî de bin. Hewceya em ferzkirinê kevnepêst bidin alî,

bibin yek. Kes destê xwe dirêjî me nake, em encax bi yekitiyê dikarin ser bikevin û pirsgirêkên heylê bîbîrin. Gerek em vê yekê jî bo zarok û civaka xwe bikin. Zarok û civaka me bi politîkayên asimilasyonê re rû bi rû ne, asteng kirina vîna jî erka meye. Ziman, çand, nasname û dîroka me tê tune kirin, tê jîbîr kirin. Seknên perçeyî rê li tiştên wiha vedike. Em bibin yek daku bikaribin pirsgirêkan çareser bikin û rê nedin tiştên bi vî rengî. Dijmin jî vî aliya Kurdê nayê yekitiyê feyde digire û bikartîne. Dijmin jî ber van aliyan me ên lewaz ev çend êrîşên hovane pêk tîne. Ger em yekitiya xwe çêbikin, em dikarin rê li van êrîşan bigrin.

Xwedî li ziman, çanda xwe derketin, parastina van nîrxan û jî civakê re pêşengtiyê kirin, erka sereka a jinê ye. Kurdistan a azad encax bi ferdê azad e li hemberî nîrxên xwe hişyar dikare pêk bê. Perwerdeya van ferdan, gihandina wan û ji wan re pêşengtiyê kirin, herê zêde jî erka jinê ye. Ji ber ku ewlekara li ser lingan mayîn û pêkhatina hebûna netewekê jin in. Banga min jî hemû partî û dezgehên Kurdistanê ye; em bibin yek, em bi yekitiyê bi hêz bin û ser bikevin. Wek gel em hebûna xwe bidest bixin, bibin yek deng ku bikaribin erka xwe a dîrokî ku li Rojhelata Navîn dikeve ser milê me, pêk bînin. Em encax bi avakirina yekitiyê dikarin ji gel û civakên li Rojhelata Navîn re pêşengtiyê bikin.

**'Aştiya hundirîn wê bi jinê pêk bê'**

**Medya EFRÎN / Endama KNK'ê:** Wek KNK bi caran me bal kêşand ser girîngiya yekitiya netewî a Kurd, lê di vê mijarê de astengiyên cidî hene. Hin partiyanê Kurd di mijara nehatin yekitiya netewî de

bi israr in. Yek ji sedema bingehîn a vê yekê jî têkiliyên li ser asasê berjewendiyên di navbera wan partî û dewletên dagirker deye. Em wek KNK hewl didin ku xwe bigihînin hemû partî û sazîyanê Kurd. Kurd bi êrîş û qirkirinê re rû bi rû ne û di pêvajoyek wiha de, bi vîna hevbeş, li ser heman tiştên hevbeş têkoşîn pêşxistin, girîng e. Kes nabêje Kurdên vê partiyanê an jî Kurdên vê perçeyê, êrîş topyekûn in, her çar perçeyê Kurdistanê bandor dike. Mînak Efrîn hat dagirkirin, li başûrê Kurdistanê jî zext giha asteke cidî, li bakur jî operasyonên qirkirina siyasî û êrîş bê navber didomin. Li Rojhelatê dardekirin û zext dom dike. Em wek KNK vê pêvajoya bi tehlûke dibînin û bangê hemû partî û derdoran dikin ku hişyar bin. Ji xwe yekane rêya vê jî yekitî ye.

Pêwîste berjewendî û nêzikatiyên teng ên partî deynin alî û li dora vê yekitiyê bicivin. Ger me yekitiya xwe avakir, em ê wê demê bikaribin xwe bi hêz biparêzin. Êrîş encax bi yekitî û parastina hevbeş dikare vala bê derxistin. Dema ku yekitî pêk bê, êrîşên li dijî Kurdistanê jî dê kim bibin û têkoşîn bi hêz bibe. Jinên ku di nav partiyan de cih digirin jî lazime li gor wê berpirsariyê nêz bibin. Em li Kurdistanê her tim bûn dengê aştiyê û yekitiyê, ji vir şûnde jî hewceya em di vê mijarê de xwedî hewldan bin. Civaka Kurd bi hewldanê jinê dikare aştiya xwe a hundirîn bi dest bixe. Ev hewldan û yekitiya me, wê hemû partî û dezgehên din bikêşîne yekitiyê, ev mijar wê wan bixe nav tengasiyê. Ji dîrokê heya roja me ya îro, jinên Kurd her tim li dijî şer û pevçûnên eşîrên Kurd sekinîne, di mijara pêkhatina aştiyê de karîne gotina dawî bibêjin. Jin gerek guh nedin nêzikatiyên teng ên partiyan, daxwaza mafên xwe bikin û di mijara yekitiyê de bi israr tevbigerin.



Evîn ZILAN

## Sêwan û sê perperîkên xwe

Di 16'ê Kanûna 2018'an de, li başûrê Kurdistanê, bajarê Çemçemalê Sêwan Qadir temen 23 salî û 3 zarokên xwe ji aliyê hevserê xwe ve tîrî kirin. Zarok demil dest jiyana xwe ji dest didin, Sêwan jî piştî çend rojan şûnde li nexweşxaneyê de jiyana xwe ji dest dide.

Kuştin û şewitandina jinan weke bûyerêk hovane her ku diçe di nav civakê de zêdetir dibe. Civak gihiştîye astekê ku tu derfetê jiyane jî bo jinan nahêle. Roj nîne ku em nûçeyên kuştina jinan nebihîsin, rojekê li Çemçemal em şewitandina Sêwan û zarokên wê dibihîsin, rojadin jî kuştina Şoxan û Şadî ku tê gotin bi guleyekê tîrî kirin. Rojek şûnde jî em nûçeya kuştina Dunya Tirîfe li Hewlerê, Sergul û Şîrîn li Ranya, Sacîde û Şino li Kelar, Fatîma û Nazdar li Dohok, Exter û Hêro li Kerkukê, Seryan û Bihar li Helepeçeyê dibihîsin. Bajar nîne ku qêrîna jinan lê bilind nebe. Jinên ku tîrî kirin, bi guleyan tîrî kirin. Ev dengê qêrîna civaka me bê hîs kiriye, ji xwe desthilatdar û hişmendiyên zîlam kerr û lal e, ev yek gihaye astekê ku civak xwîn jê biçe. Mixabin ku heya niha ne ev hişmendiyên zîlam a li dijî jinê, ne jî bûyerên wiha ên bi êş ku di nav civaka me de rû didin, hatine mehkum kirin. Kujer ne ji aliyê zagonî tîrî kirin, ne jî civak li hemberî van nêzikatî û hişmendiyan helwest rabe dike. Ji ber ku hema bêje qad nemaye ku bi hişmendiyên zîlam nehatibe pêçan û ev yek jî dengê dijberê civakê difetisîne. Lewma kuştina jinan di bin navê 'namus'ê de weke tiştek ji rêzê û normal tê dîtin, kesê yekê jî bo xwe wek maf dibîne.

Rexmê ku li başûrê Kurdistanê zagona ku kujerên jin neyên efû kirin heye, lê dîsan jî di

çerçevoya efûyên giştî û taybet de her tim ev kes tîrî berdan. Bê guman em nikarin van bûyeran ji hişmendiyên pergala desthilatdar a zîlam cûda dest bigrin. Hem ji hêla fîzîkî û hem jî ji hêla hîzrî de êrîşek her halî a li dijî jinê berdeyman dike. Ev êrîş jî li Kurdistanê ku demekê landika mirovatîyê, cihê jinê bû û jin hebûna wê a jiyane bû, hîn zêdetir ber bi çav e. Ev êrîş bi zanebûn in, bi plankirîna. Kurdistan ne tenê ji hêla çandî, aborî û leşkerî de hatiye dagirkirin, çanda dayîk-jinê talan kirin û li şûna wê hişmendiyên nêr a zîlam di nav civakê de tê belav kirin. Ji xwe yên ku teslîm nabînin û berxwe didin jî bi rêbazên cihê jî holê tîrî kirin. Ji xwe hişmendiyên dagirker wisa li civak û zîlamê Kurd kiriye ku tiştên nikarin li hemberî dijmin û dagirkeran bikin, li ser malbat û bi taybetî jî jinê didin sepandin, ev jî encamên baş bi xwe re naîen. Pergala desthilatdar a nêr bi rêbazên cûda civak jî naverok û nîrxên wê vala dike, bêtir xerîzeyên mirovan bi şeweyên hovane dinexîne.

Li başûrê Kurdistanê rewşa civakê ber bi xeteriyê ve diçe; civak di nav qeyranekê kûr deye. Kuştin wek diyardeyekê bi her cûreyekê xwe di nav civakê de belav dike. Mixabin û pirr bi êş e ku li başûrê Kurdistanê şeweyê kuştin, tundiya li dijî jinê her ku diçe zêde dibe û digihe astek metirsyar.

Di her malbatekê de gelek ji van jinan bi zûrê zewicîne, ango %90 bêtir zewacên heylî ne bi zanebûn û bi darê zûrê pêk hatine. Hebûna zarok jî di hêla ku jin li hemberî zilma heylî a di nav malbatê de bîdeng bimîne. Mînakê wê a herê ber bi çav jî Sêwan e. Sêwan rexmê ku hevserê wê gelek zext lê dikir, gef lê dixwar, lê ji ber zarokên xwe, çavên xwe ji her tiştekê re digre. Ji xwe malbat jî di bûyerên bi vî rengî

de sûçbar in. Ji ber ku malbata jin, ji ber 'şerê û namûsa' xwe rê nadin ku jin vegere cem wan û di hêla ku jin di nav şert û mercên herê bi zehmet de bîjî. Nêzikatiyên kevnepêst û zayendperest rê li pêşiya jinê digre, di hêla ku herkes bi çavek biçûk li wan binêre, ji ber wê jî ew neçar dimînin bi rewşa heylî a dijin re bimînin.

Sêwan jî yek ji wan jinan e ku bûye qorbaniya vê hişmendiyê nêr a di nav civakê de. Ji xwe ne li gor berjewendiyên birêveberên hikûmeta herêma Kurdistanê ye ku ev dosyayên kuştina jinan bê zelal kirin. Niha jî zextê li malbata Sêwan dikin daku dawî li dosyayê bînin û nehehîlan ku pirr bikeve rojevê. Qaşo di xwazîna di navbera her du eşîran de lihevkerîna pêk bînin. Ji aliyekê zextê malbatê dikin, di aliyê din de hewl didin ku rastiya heylî veşêrin û nehehîlan di aragihandinê de bê dayîn. Bi vî rengî; malbat tîrî bîdeng kirin, bi demê re êdî nema ragihandin jî qala bûyerê dike, çalakvan û sazîyan medenî jî bîdeng dibînin.

Bê guman dema em rewşa Sêwan û jinên ku hatine qetilkirin dinirxînin, em nikarin van bûyeran ji hişmendiyên DAÎŞ'ê ku jinên Kurd qetilkirin, cihê bigirin dest û binirxînin. Jin ji aliyê fîzîkî, derûnî û civakî tê qetilkirin. Lewma hemû çavkaniya xwe ji heman hişmendiyê digrin; xwedî hişmendiyan desthilatdar in, zayendperest in, komkujiyan pêş dixînin û dixwazîna dawî li hebûna jinê bînin. Rewşa jinê li herêma Kurdistanê jî ve hişmendiyê ne qot e.

Jin heya ku fêr nebe ka çawa xwe biparêze, ne pêkane ku bikare xwe jî pencên zîlamê zordar rizgar bike. Bi hêvî kirina jî zagonên pergala desthilatdar jî em nikarin tiştekê bi ser bixin, pêwîste em wek jin adaleta civakî serwer bikin û dawî li pergala nêr a zayendperest bînin.